



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 49

Gelo Pêximber Îbrahîm Hûrî bû?

(beşê duwem)

Jiyana Pêximber Îbrahîm li Erdê Ken'an

Jidayîkbûna Îshâq û serpêhatiya Hacerê:

Dema temenê *Ebram* gihîşt 99 salan dîsa Xweda jêva xuya bû û navê wî ji *Ebram* kire *Îbrahîm*, û soz da wî ku ji senseleta wî pir netewan peyda bike û di nav wan da padîşah hebin. Xweda jêra got: "**Ezê erdê biyanîbûna te bidim te û senseleta te piştî te; seranserê erdê Ken'an wek samanekî hemdem bidim te**"¹. Hêjayî gotinê ye ku parkîta "hîm" di zimanê îbranî da navdêr ji yekejimariyê dike gelejimarî, bi armanca payebilindbûnê.

Di wê demê bi xwe da Xweda ferman da *Îbrahîm* ku navê kebanîya xwe jî bike "*Sare*" li cihê "*Saray*" û soz da ku kurekî wê wê hebe, navê wî "*Îshâq*" be û ji wî padîşah û netewe peyda bibin; tevî ku temenê "*Sare*" wê hîngê êdî 90 sal bû û temenê *Îbrahîm* 100 sal bû. Pêş wê dîsa Xweda ferman da ku kesên nêr bêne sunetkirin. *Îbrahîm* hate sunetkirin dema temenê wî 99 sal bû û kurê wî *Îsmâil* û hemû xizmetkarên wî jî hatin sunetkirin.

Îbrahîm bi malbata xwe va berê xwe dan rojava û li padîşahiya "*Cerar*" li nêziya Derya Sipî (li başûrê bajarê Gazayê) bi cih bû. Bi sedema bedewiya *Sareyê* (tevî ku gihîştibû nod salî!) û ji tirsê li ser jiyana xwe, *Îbrahîm* angaşt kir ku *Sare* xwişkê wî ye. Padîşahê *Cerar Abimalik Sare* bir. Bi şev, pêş ku pêra rakeve, Xweda di xewnê da jêra got ku *Sare* kebanîya *Îbrahîm* û ferman dayê ku wê ji malxîyê wê ra vegeîne. Di beyanê (sibehê) da *Abimalik gazî Îbrahîm* kir, bexşandin jê xwast û lome jê kirin çima rastiya *Sareyê* ji wî veşartîye. *Îbrahîm* li xwe mikur hat û got ku ji ber tirsê kuştinê rastî veşartîye².

Abimalik camêrî li *Îbrahîm* kir, gelek mîh, çêlek, kole û carî dane wî, û destûr dayê ku li kîjan herêmê ji padîşahiya *Cerar* bixwaze dikare lê rûne³. Di pey ra zarokekî *Sareyê* çûbû bi navê *Îshâq*, temenê *Sareyê* 90 sal bû û temenê *Îbrahîm* 100 sal bû. Herdu bira *Îsmâil* û *Îshâq* mezin bûn û *Sareyê* biryar da ku kurê wê *Îshâq* mîratxurê yekane ji *Îbrahîm* ra be. Ji *Îbrahîm* xwast ku bera *Hacerê* û kurê wê bide. Ev daxwaz pir li zora *Îbrahîm* hat, lê Xweda ferman dayê ku daxwaza *Sareyê* bi cih bîne⁴.

Di beyanê da *Îbrahîm* hinek nan û qelazek av da *Hacerê* û ferman dayê ku bi kurê xwe *Îsmâil* ra here. Ti hesp yan jî Hêştir jî nedanê ku lê siwar bibin. *Hacer* bi kurê xwe *Îsmâil* ra çû û li beriya (*Bîir Sebi'e*) (بئر سبع) başûrê (Îsrâil / Filestîna niha), li tixûbê biyabana Sînayê wenda

bû. Qelazê avê vala bûbû. *Îsmâil* danî bin darekê û çû dûr ji wî rûnişt daku ew mirina wî ji êşa tîhbûnê nebîne. Li wir dagirî û dengê xwe bilind kir.

Xweda dengê *Îsmâil* bihîst dema wî ji ber tîhbûnê digiriya. Rabû yek ji ferîştên xwe şand ku *Hacerê* û zarokê wê rizgar bike. Ferîşt jê xwast ku ew netirse û ew hêminand ku kurê wê namire, û ewê bavpîrê neteweyeka payedar be. *Hacerê* bîreka avê dîr, qelaz jê tijî kir û av da kurik. Bi derbasbûna rojan *Îsmâil* gewre bû, bi avêtina tîr-kevanê bû şahreza û li beriya *Faran* (bakurê biyabana Sînayê) rûnişt. Dayîka wî ew bi jinekê ra ji erdê Misirê şû kir (zewicand).

Ezmûna xwedayî û mirina *Îbrahîm*:

Xweda xwast ku baweriya *Îbrahîm* biceribîne û ferman dayê ku kurê xwe *Îshâq* serjêbike bike û wek qurban li ser ûcaxekî li ser kopa çiyayê *Muriyya* (çiyayê Sehyûn li *Ûrşelîm* / Qudus) pêşkêş bike. *Îbrahîm* fermana Xweda bi cih anî û dema ku xwast *Îshâq* serjêbike, ferîşt hate ba wî û beranek ji ba Xweda bi xwe ra anî ku ji dêvila *Îshâq* bike qurban. Xweda *Îbrahîm* pîroz kir ji ber ku hêza baweriya xwe ji Xweda ra mêlag (îsbat) kir. Xweda soz da wî ku senseleta wî pir bibe û ewê li dijî hemû dijminên xwe serkeftî be⁵.

Îbrahîm bi kurê xwe *Îshâq* ra vejeriya û li ba (*Bîir Sebi'e*) (بئر سبع) bi cih bû. Ew bi vî navî hate binavkirin ji ber ku *Îbrahîm* ew bîr bi heft berxan ji *Abimalik* kirîbû. *Îbrahîm* pir caran bi bakur da diçû warê xwe yê kevin li nêziya *Hêbrûn* li erdê Ken'an. Li wir kebaniya wî *Sare* mir û temenê wê 127 sal bû. *Îbrahîm* li ser *Sareyê* pir xemgîn bû û ji *Hittîtan* ra got ku wê demê li wir serdar bûn: "**Ez biyanî me û hatime ba we, ka cihê gorekê di goristanên xwe da bidin min ku ez miriya pêşiya xwe têda veşêrim**"⁶.

Hittîtan destûr dane *Îbrahîm* ku termê kebaniya xwe di kîjan goristanê da dixwaze veşêre. Lê belê *Îbrahîm* ev tişt nepejirand û xwast ku şikefta bi navê (*El-Mekfîle*) (المكفيلة) bifiroşin wî daku kebaniya xwe têda veşêre. Xwediyê şikeftê *Îfron* kurê *Soherê Hittîti* عَفْرُونَ بْنِ صَوَّحَرِ الْحِثِّيِّ şikeft diyarî da *Îbrahîm*. *Îbrahîm* li ser ya xwe sûr ma ku şikeftê bikire. *Îfron* ti çare ji bilî firoştinê nedît û şikeft bi 400 şaqil zîv firoşte *Îbrahîm* û *Sare* têda hate veşartin⁷.

Dema ku *Îbrahîm* kal bû ji serekê koleyên xwe ra, ku hemû kar û barê mala wî dikir, got: "**Destê xwe têxe bin rana min, ez te bi sondkirin didim, bi xwedayê asîman û zemînê ku tu ti jinan ji keçên Ken'anîyan ku ez di nav wan da rûniştîme ji kurê min ra neyînî, na, bila ji erdê min û ji êla min be, tu yê herî û kebaniyekê ji kurê min *Îshâq* ra bînî**"⁸.

Kole fermana serwerê xwe *Îbrahîm* bi cih anî. "**Rabû û çû Eram El-Nehreyn, bajarê Nahûr**", ji gotinê tê xuyakirin ku bajarê *Nahûr* bajarê *Haranê* (Hêranê) ye. Ji wir keçek anî navê wê "*Rifqet keça Betûil bin Nahûr*" ku ji *Îshâq* kurê *Îbrahîm* ra bibe kebanî.

Piştî mirina *Sareyê*, *Îbrahîm* bi cariyekê ra şû bû, navê wê *Qetora* bû. Jêra çend zarok anîn. Hemû milk û samanê xwe da kurê xwe *Îshâq*. Û kurên xwe ji cariyên hinek dirav da wan, ji ba *Îshâq* bi dûr xistin û bi aliyê rojhilat da şandin⁹.

Dema ku temenê *Îbrahîm* bû 175 sal wexer kir û kurê wî *Îshâq* ew di şikefta (*El-Mekfîle*) da veşart ku berê kebaniya wî *Sare* têda hatibû veşartin.

Eve kurtahiya jînenîgariya *Îbrahîm* ku di Tewratê da hatiye.

Çarşemb, 02.03.2016

Jêder

- ¹ Sifer El-Tekwîn, Eshah 17, ayet 4 - 8.
- ² Sifer El-Tekwîn, Eshah 20, ayet 11 - 13.
- ³ Sifer El-Tekwîn, Eshah 20, ayet 14 - 15.
- ⁴ Sifer El-Tekwîn, Eshah 21, Ayet 12 - 13.
- ⁵ Sifer El-Tekwîn, Eshah 22, ayet 8.
- ⁶ Sifer El-Tekwîn, Eshah 23, ayet 3 - 4.
- ⁷ Sifer El-Tekwîn, Eshah 23, ayet 7 - 20.
- ⁸ Sifer El-Tekwîn, Eshah 24, ayet 2 - 4.
- ⁹ Sifer El-Tekwîn, Eshah 25, ayet 1 - 6.